DENGÊ ZENGIL LI HER CIHÎ HAT QEDEXEKIRIN..!!!

* DU XWENDEWANÊN ZENGIL HATIN GIRTIN !
* HESNÊ ZER, JI ZÊR BIHATIR BU !
* NAQOSA DÊRA HAT QEDEXEKIRIN !

(dawi rûpelê 2.)

zengil zengil e,
çi bike li cî ye!

Sal:1 hejmar:3-4
Êlûn-1985

# ZENGIL

xwedî: geşredîn
berpirsiyar: aladîn
çapxane: rûknedîn

organa komîta navendî ya rêxistina TENGEZAR

## di festîvala 12 mîn a xortên cîhanê de xortên kurd nehatin qebulkirin !!




XORTO;

HÛR BIFIKIR, DÛR BIFIKIR, KÛR BIFIKIR, ŞÛR BIFIKIR...!

## ZENGİL HAT QEDEXEKİRİN...

Piştî derketina zengilê me belediya Mûşê zengil qedexekir. Divê jivir û şûnda êzingvanên Mûşê Zengilên kerê xwe derxin. Waxta ker bi zengil dikewin nav bajêr ji şinge-şinga zengilên wan, bajarî nikarin razin. Yan jî, ji xewa şiyar dibin. Ji ber vêya jî, belediya Mûşê Zengil qedexekir.

Xelkê Mûşê pir kefxweş bûn. Lê belam êzingvanên Mûşê ji dij wê qirarê disekine. Rojnamavanên me bi serokê êzingvana **Ali ZENGILZONK** û sekreter **Şemsî ZENGİLZIZ** ra hevpeyvînek çêkir. Ali ZENGİLZONK got: "Heta kû ji me bê, em dijî vê qirarê bisekinin " ji ber vê 31 sibatê dê meşekî çêkin. Divê meşê da her êzingvan bi kerê xwe yê bi zengil hazir bibe. Ewê kû ne xwedî ker in, ewana jî dikarin zengilekî bixin stuwê xwe û bi wî celebe beşdar bibin.

**XELKÊ ME WERIN CEM ME !!**

**BÊ HENEK**

Ji bo alîkariya we pir spas dikin. We em gelek dilşad û kêfxweş kirin. Em hêvîdarin kû hûn dê di rojên pêşde jî, ji me re karîkatûr, pêkenîn, helbest û h.w.d ên xwe rêbikin.

Lê tiştek heye ku em nikarin, karîkatûr, pêkenîn, û helbestên ji me re tên, hemû yan di hejmarekê de çap bikin. Ji ber vê yekê emê hinik ji wana di hejmarên pêşiya me de çap bikin.

Bi silavên biratî û dostanî.




### PRENSÎBÊN ME

1- Rexnegirtin heye, rexnelixwegirtin tuneye !
2- Rexne li hemû kesan tên girtin
Hêrsketin heye, daxuyanî kirin tuneye !
3- Emê timî şûjînê di çavên xwe rakin,
Ken dibe girî nabe !
4- Ji du meha carekî derdikeve, belkî jî dernekeve
Sebirkirin heye, meraq kirin tuneye
5- Nivisên bên, bê sansûr tên çapkirin
Qest heye, navnivîsandin tuneye !
6- Kovara me ne malê bavê kesî ye
Demoqratbûn heye, Dîtina teng tuneye !

**zengil zengil e, çi bike li cî ye.**

*

**Kovara Qerfa**

*

**Ji du meha carekê derdikeve, An dertê, an dernayê.**

*

**Berpirsîyar:**
TENGEZAR

**Redaksîyon:**
Serdar SAMİ
Heval HEVAL
Bêkes HAWAR

*

**Navnîşan:**
**Krållingegr. 23bv**
**163 62 Spånga**


**Post Box 7031**
**163 07 Spånga**


Kurdiskt skämt tidning++Redaktion:S.Sami,H.Heval,B.Hawar++

*Zengil derket. Dengê wî bela bû çarmedor. Gelek kêfxweş bûn, hinek jî aciz bûn û qehirin. Bilbil jî nav ewên kû aciz bûne, şûna xwe girt. Li jêr hûn pevçûna bilbil û zengil bixwînin:

Zengil girt û got:
**Ne gulim, ne jî simbil.**
**Ne cehim ne jî gilgil.**
**Nizam çi dixwaze ew bilbil?**
**Çi zirar dîtiye jî Zengil.**

Bilbil girt û got:
**Ne gul dixwazim ne simbil.**
**Ne ceh dixwazim ne gilgil.**
**Ez im ez bêçare bilbil,**
**Guh li min ker kir ev Zengil.**





Zengil:
**Ez zengil im serî hişkim.**
**xwedî qesr û xwedî koşkim.**
**Welle pergel li te pûşkim,**
**Pêsîra min berde bilbil.**

Bilbil:
**Ne dost dizane, ne jî xatir,**
**bes dengê xwe neke bêtir.**
**Te ez kirim, ji dîna dîntir,**
**Dermanek ji destê zengil .**


Zengil:
Ezim ew zengilê qedîm.
Wê kêfê ji tera bernadim,
K.....jêkim te bikim hadim,
Bese banzdayî ser gulê...


**Bilbil berda !**






www.arsivakurdi.org



"EM KÛÇIK
JI MALBATEK PAQIJ IN
JI DÊLEGURÊ NE
Û NABIN MIROV JÎ"


Mamostekî Tirk, par li ser teorîya Darvîn a "pêvajo" yê dersa şagirtên xwe dabû. Wek em pê dizanin Darvîn di teorîya xwe ya "pêvajo" yê de îspat kiribû, ku di pêvajoyeke gelek dûr û dirêj de hemû mirov ji nîjadê (irqê) meymûnê çêbûne. U ji doma Darvin heta îro hemû mirovên zanistker li ser vê teorîya Darvîn lêkolîn û lêgerînên zanistî çêkirın; teorıyê rast dîtin û wê hîn baştir vekirin û dewlemend kirin

Oyyy!..guhên belîs kerr be...wezîrê cunta Tirk a perwerdekarîyê (wezîrê muarîfê) pê hesîya ku li Tirkîyê, li dibistanek behsa teorîya Darvîn hatîye kirin. Di cî de ferman da û wî mamosteyî da dadgehê. Mamostê reben ji mamostetîyê avêtin.Sedemê avêtina mamoste jî ev şandan:

"Teorîya Darvîn ne rast e. Ne li gor nîjada Tirkan e. Em Tirk ji meymûnê çênebûne û nabin mirov jî. Em Tirk Li Ergenekonê ji dêlegurek (gura me) çêbûne. Di pêvojayê de em, îro bûne Kûçik. Serokê herî mezin Atatirk jî vê yekê qebûl kiribû. Ica kî li gor teorîya Darvîn bêje "em ji meymûnê çêbûne" ew çax li dij Kemalîzmê jî tê. Ji vî sedemî kîjan mamoste di dersên xwe de qala teorîya Darvîn bike; ez wî/wê wek vî mamosteyî, ji mamostetîyê digrim û davêjim. U dê ji îro pê de li Tirkîyê, lidibistanan teorîya kûçiktî bê hîndekirin." ——— ZARGO




ZEMBÎL FIROŞÊ ASRÊ BÎSTÛYEKÊ





• Dengê Zengilê we xweş tê guhê min. Ezê dêra vekim!..
XUMEYNÎ

• Ezê her caşekî Zengilekî pêve bikim..!
SEDDAM

www.arsivakurdi.org




**SÊ MERXAS**

Rojekê sê kes eraqê vedixwin û têra xwe serxweş dibin. Yek ji wan diqîre:

-Wele, ezê hawha bi dewletê bikim!

Yê din dibêje:

-Na wele, ezê di jina sed bavê serokwezîr...

Yê din dibê:

-Ma serok komar çi ye kuro? Ezê hawha bi wî bikim.

Di vê navberê de du leşger dixuyîn. Hersê serxweş çaxa çav li leşgeran kirin, qidûmen wan şikestin û her yekî ji xwe re li cihekî veşartinê gerya.

Yek ji wanê serxweş diçe ser darekê. Yek dikeve bîrê û yê din jî dibîne ku wa kerek li qiraxa rê ye, hema ew jî xwe dide ber kerê.

Her du leşgeran ew dîtin. Rabûn çûn cem yê li ser darê û jê re gotin:

-Kuro were xwarê!

-Wele, ez nikarim.

-Başe, tu li ser vê darê çi dikî?

-Ez bilbilê vê darê me, ez li ser vê darê dixwînim.

Rabûn çûn cem yê di bîrê de.

-Kuro derkeve der!

-Wele ez nikarim.

-Tu di vê bîrê de çi dikî malxirap?

-Bi serê we ez beqa vê bîrê me!!

Rabûn çun cem yê li tenişta kerê

-Kuro tu li cem vê kerê çi dikî? Tu fedî nakî!

-Wele, ez dahşika vê kerê me.

Leşgeran dît ku, ker nêre.


-Kuro malxirap, ne va ev ker nêr e!

-Wele diya min nexweş ketîye, ez bi bavê xwe re digerim, ma ji we re çi...!

Brîndar

www.arsivakurd.org

# derziyê di çavên xelkê şûjinê di çavên xwe rake!




Sekreterê partiyê rojekê diçe dibistana partiyê:
-Ez kadirekî ji we dixwazim.
-Başe. Em vî biraderî bidin te. Sê zimanan zane.
-Ez kadirekî kû baxive naxwazim; yekî kû li min guhdarî bike dixwazim..!!!

## TÎVÎNGA XÎRABE

BATTÊ

Hikmê sê mirovan, bi îdamê hat bîrîn yekî İngilîz, Frensî û Kurd.

Ji yê İngilîz pirsîn:

-Tu duxwazî bi çi bê kuştin?

-Bi tivingê

Yê İngilîz birin ber dîwar û emir dane leşkerekî bi tiving da wî kuje yê leşker lingê tivingê kişand, tiving ne peqî. Ew ji kuştinê xilas bû.

Ji yê Frensî jî pirsîn, wî jî weke yê İngilîz bersivda.

Tiving carek dî ne peqî.

Dor giha yê Kurd û jê pirsîn, wî bersiv da;

-Ez dixwazim bi şelîte bême kuştin.

Tev mane bihitî û gotin

-Çima?

Yê Kurd bersiv da;

-Ma qey hûn korin? Ev tiving xirabeye na taqe!









KURDÊ QONYA U WERGER

Kurdek ji yên Qonya hate Swêd.
Polis jê pirsî:
-Tû bi çi zimanî werger dixwazî?
-Bi Kurdî.
Polis wergerek ji Kurdên, Kurdistana Sûrî anî.
Yê polis ji werger re got da bi pirse:
-Te çi karê siyasî kiribû, û tû endamê kîjan rêxistinê bûyî kû te êdî nikarîbû di welat de bijî?
-Ez di örgütek dewrimcî de çalışmış bûme, min banka soymiş kiriye û adam kaçırmış kiriye.
Yê werger tiştek fêm nekir, û got!
-Tu bi Tirkî daxifî keko; ez tiştekê ji tê fêm nakim.
Yê Qonyayî li werger nerî:
-Madem ki tû Kürtçe nizanî tu çawe tercümanî.

TIRK: Tu gidikî bira? EREB: Em wî ji nûve oportûnist dikin







www.arsivakurd.org

# çîroka pêkenî

**DİYARİYA ME PİROZ BE.** (1)

**Neviyê PİRO**

Em netewekê pır zirek, zana û şiyar ın. Jıbo ku em ewqas şahreze ne bı werisê ki dıbe bıla bıbe, em pê xwe berdıdıne birê. Hêşê me tım u tım jı seetê re pênc bımine tê serê me. Ew çax ji em, jêr dıbazın, jor dıbazın lezdıkın û bezdıkın, şaşo maşo dıbın wekê mırişkekê gêj, rotınine ciyê xwe û dıbêjın: Rexne dıkın, davêjıne herkesi. Ma qey gotın bı pereye? Na. Lê bırasti ji, xweliyên hemû poxanan ji lıserê me ye. Ah û gomanê me ji jê nine.

Her wıha tê zanin ku isal, hem sala xortên dınê ye, hem ji dı Swêd de sala paqıjvanan e. Xortên dınê jı bona festivala isalin, berê xwe dane Moskovayê. Lê yê me dewletê me tune bû. Na na nebû jı seri de. Tırk gotın dewletê kurdan tune u xortên dınê ji gotınê wan qebulkır û gotın Kurd lı ser navê welatê xwe nıkarın bıkevıne cıvinan, komelan, meşan û festivalan. Xudê jı wan û dê û bavên wan razibe ku barê me sıvık kırın û serê xwe ji rehetkırın. Dê slavên me yên germ û bê dewleti jı hemu xortên Dınê re bêjın. Ew bıla herıne festivalê, em ji bêne cem Kurdan ka ew çı bıserê hevde dıxın?

-Çı, çawan, lı ku derê? Tırk naloo?

-Erê wılahi, ma te nebihist? Dê rabe loo?

-Nıha tu dıbêji, Tırk gotıne ku: Dewletê Kurdan tune, jıbo wê qasi gelek bı navê Kurdistanê nekevıne festivalê.

-Ma em çı sekınine? Xeber bıdıne hemû malbadê Kurdan. Bıla bıcıvıne serhev.

-Erê, gotınê te lı ciye.

Bu hawar u gazi, xeber çû jı malbadan re. Çı mezın çı pıçuk cıvıne serhev. Hemu ji jı dıl û can xwe jı hevdu re hazır û amade kırıbûn. Cıvin destpêkır. Ketıne bın gohên hev. Hındur bû mıj û moran, têf û duman, hıngûdıng.

-Tırk çawan me dıdıne naskırın. Ma qey em mırıne?

-Em mırıbın ji dıkarın. Saxbın ji dıkarın.

-Na nıkarın, em lıvêderêne.

-Dema tu ne kari xwedi lı welatê xwe bıki, dê Tırk bıbıne xwedi. Jı sedsalan vır ve, tım û tım Tırk lı me wılo kırıne iro ji şopa kalên xwe dımeşının.

-Şoven ın, Kemalist ın.

-Çı dıbın bıla bıbın. Mêrık lı ser navê welatekê dınê xwedi soz û qerar ın.

-Ne şoven ın, ne ji Kemalist, ew me ji bı xwe re dıbın.

Dı nav vê qirin zarên û hengamê de, henek paşve gavavêtın, bı awayekê bênımej û bê esas gotın: Em dıçıne festıvalê, çıdıbe bıla bıbe. Hemû mesele çuyina festıval ye. Ev ji ji bo me fersandeke. Ki ji dixwaze bıla bê. Henek gavên xwe pêşve avêtın û gotın: "Bê tehrat û desmêj em naçıne mızgeftê. Qısmek ji navberê dêr û mızgeftê de mane bênımêj. Ev bıla bımınıne bênımêj. Ka ev KAMO çıma qireqirdıke.

Kamo, dı nav vê tef û dumani de qidike qirdike. Ma ki bıkiye. Ciyê cıvinê buye mina gundê tê de zelzele dıbe. Qirin û dengê bêjdaran xani bı serê xwe dıke. Lê Kamo dıvê cıvini de jıwan bêtırin qirini kır ku bêdengi kete nav cıvatê û xani. Dema herkes sekıni, Kamo dest bı gotınê xwe kır.

-Şıkır jı xudayê bê şırik û bê heval û bê hogır re. Hun sekıninin û ez ji serketım. Bese lo, dev jı vê berdın lo. Mırof jı dıkeve dımıre, lê herkes bı wê mıriyi re namıre. Bıla ev me re bıbe aqılek. Ev bıla jı Tırko re be. 12 ê Temuzê ji, Stockholm ji me re bıbe.

-Ev 12 ê Temuzê çiye? Ev çı mesele bu ica?

-Bava hun nasekının ku ez bı we bıdıme femkırın û bêjım. 12 ê Temuzê rojê helbıjartına paqıjvanene isal. Hemu paqıjvanên ku dı Swed de dıjın dê bıkarbın bıkevıne vê helbıjartıni. Ji bo wê qasi em evi jı Tırko re nehêlıne erdê. Devên xwe qewi bıgrın û dest bıkaruvarê xwe bıkın? Nebi nebi jı yekê Tırk re bêjın wê disa tıştekê lı ber pêyên me bıxın û me deve ru lı erdê bıxın.

Dema cıvat evi femkır. Dest bıkêf û şayi kırın. Bırasti ji ev ditın, ditıneke baş bu, kete serê herkesê ji. Madem neçune Moskovayê eva Stockholm lı bındestên me deye gotın. Mılên xwe heta enişkan, lıngê şalên xwe heta çokan dane jor û nav çevgıtıneke de cıvınê xwe xılaskırın.

Herkes gorê xwe dest bıkar û varên helbıjartınê kırın. Bı teybeti ji Kurdên siyasi, hem gıringbuniya meseleyê zu femkırın, hem ji tım û tım dı 12 ên meyan de burjuwaziya Tırk gelek derp û pıhinan xwarıne û dıxwun ji 12 ê adarê, 12 ê Elûnê, festıvalê a 12 an uhw. Lê Kurdên siyasi ev car cıdiyet û gıring buniya meseleyê femkırıbun. Çı jın û çı mêr destên xwe dan hev.

www.arsivakurdi.org

Bı awayekê zana û şereze berê xwe dane nexweşxane, çayxane, qehwexane û ebdısxanan. Xortên Kurd lı Ewrupayê doza me paşve dıbın. Pardon xelet femnekin doza me pêşve dıbın. Xebatên me jı hemu biyaniyan baştır û xweştır dıçe, lê tırsa me ji Tırkan e. Dema Tırk evi bıbıhizın wê disa pozê xwe bıxıne nava karên me. Tırk bıhistın, lê ji bo ku karê me icar pır paqıjbu, dev jı pozê xwe berdan, icar ji bıdestan ketıne nava karên me. Ev carekê himbune, merıf pozên wan bışkine wê destên xwe têkın tu destên wan jêki wê lıngên xwe bıxın. Ev ji jı Tırkan re buye nexweşiyekê pır mezın û bêderman. İlahi û bilahi wê tıştekê xwe dınav karên me bıkın weselam. Kurd ev carê hanê serî dananin her ci û rê lı Tırkan gırtın. Her ci dıbın kontrolê me daye. Heyetê hılbıjartınê ji ebdısxane ebdısxane dıgerın û dı derheqê paqıjvanan, agahdari û meteryalan dıcevinın. Beriya 12 ê temuzê heyet meteryal û dokumentên xwe cevandın serhev. Ciyê hılbıjartınê hate kıfşekırın. Seet 6,30 sıbê gelek hılbıjartın lı nexweşxane KAROLİNSKA çêbıbe. Şevê hılbıjartınê propagandeyên me erd û ezman bı serê xwe ve dıkır. Ev şev hemu Kurd ranezan, lı ser fêl û fendê Tırkan xeber dan. Sıbê hêj dikên sıbê bangnedabun, xwe berdane dora Karolinskayê.Çar dorê nexweşxanê kete bın qontrolê wan. Kesên ku dıxwesta here henduri pêşi jı bındestên Kurdan re derbazdıba. Hedî hedî mılet kete henduri û ciyên xwe gırtın. Bêdengi kete nav cıvatê, lê heyecanekî pır mezın heye dı nava odê de. Keçikek ya hurmayek bêjim çêtırine dıbe ku ne keç bıbe. Hurmeyeka spıker derket, mina hespê çırriyan û deva xwe qiçkır mina ku ji dil û can dıkene û zitıkekê lı xwe da çu wê serê odê û disa hate ciyê xweyê beri û yek bı yek, gazi merıfên heyetê kır. Navên wan got û wan da naskırın. Çaxa navê SATILMIŞ hate xwendın, Kurd dı cide serhıldan, lê spiker got:

(Dûmahik heye.)











www.arsivakurd.org

Ev karîkatûrê, Charles Phillippion, ku xwedîyê La Caricature û Le chavari e, acizbûneke zêde da xuya kirin. Ji ber vê yekê ew kowar, ji ber vî karîkatûr hat qedexekirin.



Karîkatûrîstê İngilizi Ronald Searle (1920)

## DÎROKA KARÎKATUR -1-

### Karîkatûr ji kû giha ku?

Ev karîkatûrê kû li hawîrdorê cîhanê, mirovan dikenîne û difikirîne, gelo pêşî, li ku û kengî destpêkir?

Mêjûya karîkatûr gelekî kevne. Kû mirov pir lê bikole, divê mirov vegere çaxê şikeftan. Li ser wazoyên Grek û Roma, û di hiyêroglîfên Mîsrîyan de jî karîkatûr peyda di bûn.

Karîkatûrê herî kevin, kû di pirtûkxana de heye; yê sala 1466'ne. Ev karîkatûr bi destê gravûrvanekî (gravürcü) Alman hatiye çêkirin. Lê wî navê xwe nedaye. Bi tenê, îmza xwe bi tipên E.S avêtiye. Ji ber vê yekê, E.S pîrê karîkatûrvanan tê hisabê.

Piştî vê, di qirnê(esir) 16'nde em dibînin kû gelek ressam êdî karîkatûran çê dikin. Weke resamên bi nav û deng **Jerôme Bosch (1450-1516), Leonard de Vinci (1452 1519), Bruegel (1525-1569), J.J.Boissard (1528-1602),Callot (1572-1635), û Rembrandt (1609-1669).**

Yên kû bi mêjûyê mijûl dibin; dibêjin kû karîkatûr di esrê 18'nde li İngiltere dest pê kiriye. Navê çar hûnermendan didin: **Hogart (1697 1764), Rowlandson (1756-1827), James Gillry (1757-1815) û Cruikshank (1792-1878**.

Xîşkên van hûnermendan hemû klasîkbûn, babetên (mewdu) wan bi piranî mirov bûn. Kirinên mirovan bi mûbalaxa nişan didan, û bi vê yekê dixw stin kesan bi kenînin. Karîkatûrên wan qet ne dişibiyan yên îro. Ji ber kû her tişt û her xîşk ji hev lê dikirin û pir li ser di xebitîn. Ji ber kû, di meydanê de, tiştên mûbalaxe û pêkenîn hebû navê van resman kirin karîkatûr.

Di esrê 19'nde li Fransa hûnermendên bi vî şiklî derketine. Em hemû van kesan nasdikin: **Grandville, Gavarni, Monier, û Daumier.**

Di gel van kesan de, ji Alman, Swîsre, û İtalya jî karîkatûrvan û ressam derketine.

Di beşa pêşî ya esra 19'ande tiştek li Fransa çêbû kû karîkatûr pir pêşde bir.Xortekî 26 salî bi navê **Charles Philipon,** di sala 1830'i de kovara **LA CARİCATURE** da çapkirin. Derketina vê kovarê, bû çaxekî nû ji karîkatûr re. Hûn dixwazin em ji vê demêre bêjin: "Dema karîkatûr ya zêrîn."

Charles lê nerî ku, xwendekarên vê kovarê pirin; rabû kovareke din, bi navê **Charivari** (teqeroq û qerebalix) derxist.Her dû kovar jî pir pêş diketin. Belê kêfa hikûmetê qet ji wan re ne dihat. **İmparator Lovis Philippe,** di sala 1835'ande qanûnek ji bo qedexekirina pêkenînê siyasî derxist. La Caricature bi vê qanûnê hat qedexekirin. Lê bête Charivari dev ji pêkenînê siyasî berda, û pêkenînê civakî çêkirin. **Bi vî tewrî 13 salan Charivari dom kir.** Piştî kû qedexekirin ji ser pêkenînên siyasî rabû; Charivari dest bi wan jî kir.

Ev bû, bi kûrtayî çîroka derketina kovarên karîkatûr..

www.arsivakurdi.org









MIXABIN...!

Xwedan! Tu karî vê kadînê bi ka kî û devê çêleka zer di nav kî? Lê te ji tu kesî re ne kiriye, tu jî min re jî nakî!..




www.arsivakurdi.org




## bang!

Em kedkarên Zengilê, derketina we bi navê MÎRKUT pîroz dikin û serketina we ji dil daxwaz dikin.

Me digot, qey em bi tenê ne. Lê em kêfxweş bûn, ku ji derê me jî hin kes li ser vê xebatê serê xwe diêşînin.

Em dê hê kêfxweştir bibin, ku em karibin vî karûbarî bi hev re bimeşînin. Mecal û îmkanên xwe bikirana yek û bi awayekî hê dewlemend û hê xurt xebat ji bo gelê xwe bikirana. Em dikarin vê yekê bibêjin ku, em kedkarên Zengilê ji vê yekê re amade ne.

Em di navbera du neynokan de bêjin, ku em bi her şêweyî, yekîtî re amadene. Hûn divê "ENÎ", hûn divê em "YEKÎTIYEK SIYASÎ" çêkin. Yan jî hûn tiştên din dixwazin ? ? ?

MÊRANÎ MÛ YE!...